# Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1193 | 7-Tebax-2024 | www.ronahi.net/ku/



Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ | rojnameyaronahi | @ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com | Rojnameya Ronahî | +963 984 370 218


## Ji Koma Amara strana 'Hêviyam'



**Navenda Nûçeyan**

Koma Amara ji bo bîranîna şehîd Hêvî Gabar straneke nû ya bi navê 'Hêviyam' amade kir. Hêvî Gabar 26'ê Tîrmeha 2020'an dema ku ji ber birîndariya xwe tedawî didît, şehîd bû.

Koma Amara ji bo bîranîna şehîd Hêvî Gabar (Gulistan Aksoy) straneke bi navê 'Hêviyam' amade kir. Gotinên stranê ayîdê Firat Baran û Pelşîn Munzûr e, muzîk jî ayîdê Pelşîn Munzûr e. Stran bi wesîleya salvegera 4'emîn a şehadeta Hêvî Gabar hate amadekirin.

Endama Koma Amarayê Xwezan Harûn mîksaj û aranjeya stranê çêkir. Xwezan Harûn diyar kir ku ew ji bo bîranîna şehîd Hêvî Gabar bidin jiyîn, ev stran çêkirin û got: "Heval Hêvî di sala 2015'an de di şerê Serêkaniyê de birîndar dibe. Ji bo tedawiyê derbasî Awropayê dibe. Heval Hêvî li Awropayê xwe pir biyanî hîs dike, li wir hevalên wê yên nas jî hebûn, lê belê dixwest ku heta nefesa xwe ya dawî li çiyayên Kurdistanê bi hevrêyên xwe re rûne çayekê vexwe û têkoşîna xwe bidomîne.

Ji bo bîranîna heval Hêvî, me bi heval Firat Baran û Koma Amara re ji bo ku deynê şehîdên xwe bidin, xwest stranekê çêbikin. Em ji bo heval Hêvî û hevalên ku ji bo vê şoreşê bi canê xwe berdêl dayîne, çi bikin wê kêm bimîne. Me xwest bîranîna wan bidin jiyîn. Li ser vî bingehî ez car din heval Hêvî û hevalên ku canên xwe feda kirine, bi rêzdarî bi bîr tînim. Em vê stranê diyarî heval Hêvî, hevalên şehîd, hemû hevrêyên ku têdikoşin û gelê xwe dikin. Weke Komara em car din li ber bîranîna hevalên xwe yên şehîd, bi rêzdarî bejna xwe ditewînin."

## FERHENGA BIWÊJAN

**Binpê kir:**
- Nas nekir; rêz jê re negirt.

**Bila serê xwe li dîwaran bixe:**
- Çi dike bila bike, tişta dixwaze wê pêk neye.

**Da bin lingê xwe:**
- Rêz jê re negirt.

**Da kitikan, geriya li pepikan:**
- Qîmetê malê xwe nizanî; malê xwe neparast; malê xwe ne di cihê wî de da.

**Ji deftera xwe avêtiye:**
-Êdî ti qîmetî nadiyê; êdî ti girîngiyê nadiyê; êdî jê hes nake.
Ma nanê te genim e yê min ce ye?
- Çima para hindik ji min re ya pir ji te re be?
Ma ez ebabelek im?
- Ma ez parsek im; ma ez bêqîmet im?
Ma ez Bacolî me?
- Ma ez bêcî û bêwar im?

**Ma ez kurê jinbavê me:**
- Çima we ez hiştim pêpar.
(Dema hin tiştekî dixwin, yan li hev par dikin, lê yek dimîne bêpar hingê dibêje)

**Ma ez li ber ava pîvazan im:**
- Çima navê min jî di nava navan de nîne; çima hûn hesabê min jî nakin; çima hûn min ji mirovan najimêrin.
(Dema mirovek li ber çavan nayê girtin, hesab jê re nayê kirin, wisa dibêje)

**Ma ez firaxan dişûm:**
- Bi heman wateyê.

**Ma ez kincan dişûm:**
- Bi heman wateyê.

**Ma ez şivantiyê dikim:**
- Bi heman wateyê.

**Ma ez ji Eyşika Ereb im:**
-Bi heman wateyê.

**Mendo ti kes nabêje kerê te bi çendo:**
- Dema di civatan de qîmetê yekî tinebe hingê tê gotin.

**Miriyên xwe jî bi me ranakin:**
- Qîmet nadin me; ti hesabî ji me re nakin; me ji mirovan hesab nakin.

**Pişta xwe da me:**
- Qîmet neda me; ji me hes nekir.

**Poz pê nekir/poz lê nekir:**
- Qîmet nedayê; girîng nedît; guhê xwe nedayê; li ber çavên xwe piçûk dît.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## Rûyê trajîk yê fermana 2014'an

**Navenda Nûçeyan**

Mamoste û şêwekar Bîlen bal dikişîne ser fermana 3'yê Tebaxa 2014'an û got: "Min rûyê dayikekê ji bo vê tabloyê guncaw dît. Di her xetek yê rûyê vê dayikê de min bûyerek bi êş yê pêvajoya fermana 2014'an çêbûyî xêz kiriye. Her wiha min xwest di çavên dayikê de berxwedana gelê Kurd ya li hemberî dagirkeran, vîna gelê Kurd ya serî ji dagirkeran re natewîne û gotina heta em azadiya xwe bi destnexin emê têkoşîn bikin rave bikim."



Fermana 2014'an a Şengalê ya ku 10 sal bi ser re derbas bûn, hê jî êş û janên vê fermanê zindî ne û bi dehan gorên komî nehatine vekirin. Ji bo ev ferman û hevkariya bi çeteyên DAIŞ'ê re neyê jibîrkirin bi reng û rêbazên cuda tên vegotin.

Yek ji van jî Mamoste û şêwekar Elî Bîlen'e. Mamoste demek dirêj bi xebatek hestyar û bi êş ve mijûl bû û dawiyê berhemek ku rûyê dayikek Şengalî ku hemû êş û trajiyên fermanê li xwe digre xêz kir. Di salvegera fermanê de li ser berhem û xebata wî axivîn.

Mamosta Elî Bîlen ê yek ji xwendevanên destpêkê yên Atolyeya Şehîd Delîla ya Wargeha Penaberan a Şehîd Rûstem Cûdî (Mexmûr) ku bi zorî, zehmetî û bê derfetiyên mezin karî vê atolyeyê ava bikin, heta roja me ya îro şêwekarên êş, şan û kêfxweşî û lehengên şoreşger bi tabloyan nemir dikin. Niha jî di bin sêwana vê atolyeyê de bi dehan ciwanên wargehê perwerdeya wênesaziyê dibîne.

Mamosta Elî sala 2004'an gava yekê ber bi xebatên wêne xêzkirinê ve diçe û wiha qala wan rojên xwe yên perwerdê dike: "Dema min dibistana navîn dixwend min dest bi perwerda wêne xêzkirinê kir û 4 salan min wek xwendevanekê perwerde dît."

### Êdî mamoste ye û zarokan fêrî wênesaziyê dike

Mamosta Bîlen piştî diçe zanîngehê dibîne karê hûnerê ku pê mezim bûyî û xwendina wî ji hev pir cihê ne, lê ve nebû sedemek ku ew ji karê hunerê dûr bimîne û vê dibêje: "Dema sala 2016'an min zanîngeh qedand, ez wek mamosta derbasî xebatên Atoleya Şehîd Delîla ya wêne xêz kirinê bûm. Me gelek xwendevan di atoleyên de perwerde kirin û gelek wênesaz li vir çêbûn."

### 'Her kadrajek êş û janeke'

Bîlen bal dikişîne ser tabloya ku hemû êş û janên civaka Êzidî ku 3'yê Tebaxa 2014'an ferman li wan hate kirin û wiha pêde çû: " Min gelek zehmetî û westan bi çêkirina vê tabloyê ve dît. Ji ber ku her katrajek yê vî wêneyî serpêhatiyek bi êş ya civaka me ya Êzîdiye. Civaka Êzîdî ne tenê îro, ne di demê DAIŞ'ê de ev bi salane tên qirkirin. Tişta ku DAIŞ'ê bi ser gelê me yê Êzîdî de anîn ji derveyî pîvanên mirovahiyê bûn. Min hewl da bûyer û serpêhatiyên di demê DAIŞ'ê de li ser gelê me yê Êzîdî hatî pêkanîn bînim ser ziman."

### 'Keziyên li keviran alandî, zarokên çolê hiştî, bi komî kuştin…'

Çêkirina taloyek wê ne pir hesan be, mamosta Bîlen jî her trajediya li civakê bi hestek bê pênase xêz dike û zindî dike û li ser vê jî vê nirxandinê dike: "Bûyerên divê fermanê de herî zêde bandorî li ser min çêkirî porên keçên ciwan yên li ser keviran, bi komî kuştina mirovan, zîndî bin ax kirina mirovan û bi taybetî jî hiştina zarokan ya li ber keviran, ez gelek û gelek êşandim û me di xêzkirina wê de gelek zorî kişand."

### 'Herî zêde dayik êş û janê dikişine'

Bîlen tîne ziman ku her hunermendek bi şêweyekê hunera xwe hestên xwe rave dikin û bi berhemê çêdike hest û êşên xwe yên nekarî bîne ser ziman xêz dike û wiha pêde diçe: "Min jî hestê xwe bi vê tabloyê anî ser ziman. Gelek kes vê pirsê dikin. Çima te li ser rûyê dayikê ev wêne xêz kiriye? Ji ber ku di civaka me de kesên herî zêde êş dikşînin û berdêlan dide dayike. Min rûyê dayikekê ji bo vê tabloyê guncaw dît. Di her xetek yê rûyê vê dayikê de min bûyerek bi êş yê pêvajoya fermana 2014'an çêbûyî xêz kiriye. Ne tenê ev bûyer, 74 ferman bi serê gelê me yê Êzîdî de hatine. Ji ber wê jî min rûyê dayikê pîr nîşan daye û di her xetek yê rûyê wê de bûyerek aniye ser ziman."

### Berxwedana li dijî dagirkeriyê û vîna gelê Kurd nîşan da

Mamoste Bîlen hevkarî û xiyaneta li civaka Êzidî û berxwedana gerîla jî ji bîr nekiriye û wiha got: "Min xwest divê tabloyê de xiyaneta kesên ku gelê Êzîdî rû bi rûyî vê êrişê hêlayî û parastina gelê Êzîdî ya ji aliyê bazên azadiyê ve vebêjim. Li gorî dîtina min bûyera ji hemû yan bi êştir, êrişên hêzên pêşmerge ya li ser bazên azadiyên bû. Her wiha min xwest di çavên dayikê de berxwedana gelê Kurd ya li hemberî dagirkeran, vîna gelê Kurd ya serî ji dagirkeran re natewîne û gotina heta em azadiya xwe bi destnexin em ê têkoşîn bikin rave bikim. Tu jinên cîhanê nekarîn mîna dayikên me yê Êzîdî xwe li hemberî van êşên mezin li ser lingan bigirin. Dema em temaşe dikin dayikên me yên Êzîdî li hemberî hemû êş û zoriyan xwe li ser lingên xwe digire û têkoşîn dike. Ev jî hêza jina Kurd e."

### 📷 Bi kamîreya Birûc Resûl



## Hevserokê KNK'ê: Dem dema yekrêzî û berxwedaniya gelê kurd e



Hevserokê KNK'ê Ahmed Karamus anî ser ziman ku hewldana dewleta Tirk a dagirker ji bo dagirkirina Başûrê Kurdistanê pilaneke sitratejîke û siyaseteke kevnar e û wiha domand: "PDK'ê beşek di pilana dagirkeriyê de ye, ev yek jî xeteriyê li ser hebûna gelê kurd ava dike. Lewma jî dem dema yekrêzî û berxwedaniya gelê kurd e. "**R-4**

## 'Em ê li hemberî zext û tûndiyê govenda xwe bigerînin û sitranên xwe bêjin'

Li Bakûrê Kurdistanê zexta li ser çand û hunera Kurdî zêde bûye. Li bajarên Bakûrê Kurdistanê stranbêj û welatiyên ku govendên kurdî digrin, tên binçavkirin. Hevseroka Desteya Çand û Hunerê ya Dem Partiyê Cemîle Turhalli da xuyakirin ku dewleta Tirk ya dagirker li dijî çand, ziman û hebûna gelê Kurd û Kurdistanê ye, ji ber wê nikare stranên Kurdî jî bibihîze.**R-5**





## PDK'ê û zihniyeta baviksalariyê ya li dijî jinê

PDK'ê ya ku xwedî hişmendiya zilamê serdest e jin li Başûrê Kurdistanê bê rol û maf hiştiye, herwiha nirx û pîvanên civakê jî li gorî berjewendiyên xwe yên desthilatdariyê bikar tîne.**R-2**


# Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1193 | 7-Tebax-2024 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S


# GELÊ MEXMÛRÊ DI BERXWEDANA LI DIJÎ GEF Û ÊRIŞAN DE BI ISRAR E

10 sal beriya niha dema çeteyên DAIŞ'ê berê xwe dabûn Hewlêrê û heta navçe û wargeha Mexmûrê hatibûn, gerîlayên HPG/YJA-STAR, li gel hêzên parastina wargehê berxwedaneke mezin nîşan dabûn û cara yekem bû ku çeteyên DAIŞ'ê têk diçûn. Piştî 5 rojan serokê PDK'ê çûbû wargehê û sipasiya gerîlayan kiribû. Îro jî heman PDK'ê li dijî Tevgera Azadiyê hevkariya dewleta Tirk a dagirker dike, gerîlayên ku Mexmûr û Hewlêr ji DAIŞ'ê parastin, îro rastî xiyaneta PDK'ê tên, Mexmûra ku xwe kir mertal ji bo Başûr, îro di bin gef, êriş û zextên PDK'ê û dewleta Tirk a dagirker de ye.**R-3**



## Ji çiraxên hunera kurdî



Hunermend Cemal Tîrêj ku yek ji stûnên hunera Kurdî li Cizîrê tê hesibandin, ji ber ku wî berhevokek mezin ji berhemên hunerî yên bedew û xweşik pêşkêş kiriye ji stranên şoreşgerî û welatparêzî û awazên bi coş ên hêja ku ji hêla stêrên hunerî yên Kurd ên mezin ve hatine gotin.**R-7**



## 'Siyaseta Îranê ya li dijî jinan siyaseta qirkirin û pişaftinê ye'

Rêveberiya Komeleya Mafê Mirovan ya Kantona Cizîrê Evîn Cuma bang li hemû rêxistinên navneteweyî û tevahî saziyên mafên mirovan kir ku li dijî cezayê darvekirina Şerîfe Muhammedî û Pexşan Ezîzî ku ji aliyê rêjîma Îranê ve hatiye birîn, dengê xwe bilind bikin.**R-6**


**Jina Êzidî wê çawa xwe biparêz e** — Nehîr pale — R-2

**Erdogan pêşengê suîkastcî û kujera ye** — Zekî Bedran — R-5


**Nêzîkbûna dengê defa şer** — Farûk Sakik — R-5


**Demsala Çapkirina Pirtûkan** — Kemal Necim — R-7

# PDK’ê û zihniyeta baviksalariyê ya li dijî jinê

PDK’ê ya ku xwedî hişmendiya zilamê serdest e jin li Başûrê Kurdistanê bê rol û maf hiştiye, herwiha nirx û pîvanên civakê jî li gorî berjewendiyên xwe yên desthilatdariyê bikar tîne.

**Amara Baran/Qamişlo**

Bi giştî ji ber çanda serdest a zilamsalarî, jin pir kêmtir derfeta wê hebûye ku di nava civakê de xwedî rol bin. Lewma piranî bûyer û guhartinan rengê zilam bi xwe ve girtiye. Heya astekî jî divê bê gotin ku qala rola jin nehatiye kirin. Lê eger hûr li dîroka Başûrê Kurdistan çi beriya avabûna dewletê Iraq çi piştî damezrandina wê binêrin, gelek kesayetên jin hene ku li ser rewşa civakê xwedî rol û bandor in. Mînak; Xanzada Mîrê Soran, xwişka Mîr Silêman, Fermanrewayê mîrêtî Soran bûye ku piştî Mîr Silêman ji aliye Sultanê Bexda ve tê kuştin, dibe mîrê Soran (Sedeya 18) û paytexta wê li “Herîr” bûye. Balkêş e ku heya niha jî behsa Mîr Xanzad tê kirin ku di mijara kar û xebatê rêveberiyê de serkeftî bûye. Yan “Adîle Xan”, hevsera Osman Paşayê Caf ku di dawiya sedsala 19’emîn û despêka sedsala 20’mîn de rolêkî berbiçav lîstiye di fermanrewayiya “Şarezûr”. Heta kesekî rewşenbîr û bixwebawer bûye û ji aliyê rêveberî û xweşewîstiya wê di nava gel de pir bala berîtaniyan kişandiye. Yan jî “Hepse Xanê Neqîb” ku jinêkî zîrek û navdarê bajarê Silêmanî bûye. Di sala 1930 de ji Komeleya Gelan (NY) re nameyek dinivîse û daxwaziya mafê gelê kurd dike. Di sala 1946 de piştevaniya Komara Kurdistan li Mehabadê daye û ji aliye madî û manevî ve alîkarî kom kiriye. Her wiha “Encum Xan” li sala 1919 li Stenbolê Komeleya Pêşxistina Jinên Kurd ava dike. Rabîe Xan, Seêdiye Xan û hwd. di serdemên şerên cîhanî de di birçînemana gel rolê berbiçav lihîstine; û gelek jinên din di qad û pêvajoyên cuda xwedî rol bûne.



### Jinê di nav tevgerên kurd de cih girt

Di serdema Komarî de tevgera jinan pêş ve diçe û êdî jinan di nava tevgerên kurd de cîh digrin. “Margirêt” ku jinêkî aşûrî ye, di despêka tevgera Îlon de cîh digre û tevlî têkoşîna çekdarî dibe ku bala gel û pêşmerge jî dikşîne. Pişt re ji aliyê rêveberiya tevgera Îlonê ve biryara kuştina wê derdikeve. Kuştina Margirêt heya niha jî yek ji wan bûyeran e ku bi veşartî maye û tevî raveyên cuda derbarê vê buyerê, sedema wê bi temamî nayê zanîn. Leyla Qasim jî jinêkî dinê têkoşer û navdarê kurd e ku endamê rêxistina ciwanên PDK’ê ye. Dema rejîma Baasê di 11.03.1970 de yekalî otonomi ragihand, şandeya PDK’ê Mesud û Îdrîs Barzanî û Mehmud Osman amade nebûn û piştî çar salan ku dîsa şer dest pê kir, Leyla Qasim tevî çend hevrêyê xwe dixwazin li balafirxaneya Bexda çalaki bikin ku ji aliye rejîmê ve tên girtin û li 13.05.1974 tên darvekirin. Têkoşîna Leyla Qasim bandorekî mezin li ser gelê kurd û raya giştî cîhanê kir û piştî aşbetaliya 1975 û ji nû ve despêkirina têkoşîna gelê kurd, rola jinan ji aliyê siyasî û rewşenbîrî ve zede kir û bû sedem ku piranî partî û rêxistinan, saziya taybet a jinan ava bikin û di astekî kêm de jî be di nava refê pêşmerge de cîh bigrin. An Ayşe Gul`a xelkê Koye ku di bin eşkenceya rejîma BEÊS şehîd dibe. Piştî raperîna 1991 jî hejmarekî zede ji saziya hizbî û serbixwe ya jinan ava bûn û di astên cuda cuda de çalakiyên cûr bi cûr pêk tînin. Lêbelê hîna meseleya rêgezî li Başûrê Kurdistan wek pirsgirêkekî sereke ye û têkoşîna rêxistinên jinan, partiyên siyasî, hikûmet û parlemanê nikarîne rê ji tundûtîjî li hember jinan bigrin ku hejmarekî zêde dibin qurbanî. Bi giştî jî tevgera PDK’ê ji aliye zihniyetî ve tevgera zilama serdest e. Ji ber ku eger pîvan ev e ku gelo ji bo çareserkirina pirsgirêka jin ku meseleyekî civakî ye çi qas gav hatiye avêtin? Bersiv neyînî ye. Di rêgeza vê tevgerê de jin nayê naskirin û têkoşînekî fikrî û praktîkî ji bo çareserkirina kurtirîn meseleya civakî nehatiye kirin.

### Plan û projeyên PDK’ê

PDK’ê jî mîna bizavê din ê serdemê xwe, ti girîngî nedane meseleya jin. Bi kurtî ne di peyrew û bernameyê wan de û ne di praktîkê de tu pîlan û projeya PDK’ê derbarê pirsgirêka jinê tunebûye; yên ku bi navê Yekîtiya Afretanî Kurdistan û pişt re jî saziyên ku li kêleka partiyê an di nava hikûmetê de ava dibin, tenê di xizmeta armanca giştî ya PDK’ê dikin ku di nirxandina dawiyê de xizmeta zihniyeta zilamê serdest dike. Li gel ku ji 1991’an ve hema hema Başûr serbixwe ye, diviyabû desthilata heyî ku para wî ya sereke PDK’ê ye, di mijara tundî û tûjiya li ser jinê de di zihniyet û zagonan de guhertin bikirina û hin gav bavêtana lê guhertineke ber bi çav di warê jinê de çênebûye, heye ku kiryarên dijî jinê zêdetir bûne. Zilam û deshilata ku li ser bingehê têgihînên eşayîrî û paşverûtiya axatiyê li Başûrê Kurdistanê li ser bedena jinê serwer in. Qeyd û zincîr li mêjiyê jinê dane ji hemû qadên jiyanê (siyasî, aborî, û qadên din) bêpar kirine. Tundî û tîjî lêdan û her cûre çewisandina ku li ser jinê tê bikaranîn ji aliyê mêrê deshilatdar ê ku hêmanên paşverûtî, eşîrtî û axatiyê di xwe de diparêze hiştiye ku jin ji derveyî xwekuştinê çareyê di tiştekî din de nebîne.

### Hikumeta herema Kurdîstanê tûnd û tijîyê pejirand

Di 27ê Mijdara sala 2010’an de Hikumeta Herêma Kurdistanê bi awayekî fermî tund û tîjiya li dijî jinê li Kurdistanê pejirand. Dest bi pêngavên tedbîrgirtinê kir. Di 2011’an projeya zagona tundiya malbatî ji aliyê parlemanê ve hat erê kirin, di wê derbarê de gelek biryar derxistin, Lê ew biryar nehatin pratîzekirin û hin ji wan jî hatin îptalkirin. Diyar e, hikumetê ji ber zextên pêkhateyên ku deshilat li ser ava bûye (axatî, meletî û paşverûtiya eşîrtî) nikariye biryarên xwe cîbicî bike, Lewma ew bi xwe jî dibe beşek ji vê zihniyet û pirsgirêkê. Lewma ev pirsgirêk mijareke zihnî ye, eger guhertin di zihniyetê de neyê kirin, mirov nikare behsa pêşketin û bilindbûna asta jinê bike. Guhertina zihnî jî bi demê re çê dibe, lê hikumet dikare ji bo vê prosese kurterê û çareseriyên navber an gav bi gav pêk bîne, lê diyar e hebûna xwe di tunebûna jina azad de dibîne.

### PDK’ê exlaqê gel aniye ber têkçûnê

Ev zihniyeteke xwe dispêre eqliyeta baviksalarî, eşayîrî a olperest ya feodala paşverû. Ray û rahendên van pirsgirkan gelek kûr e, mixabin ku nifşên nû jî li ser wê zihniyetê hatine mezinkirin. Ev zihniyetên req yên mîna keviran rê nedane di warê jinê û civakê de guhertinek pêş bikeve. Ev îdeolojiyeke pir kevneperest a tîregerayî ye. Pir paşketî û nezan e, hizir û bîr çi ye nizanin. Kesên bi vî awayî cihê wan di civaka kole de jî nîne, takeperestî, takgerayiya cinsiyetparêz zêde di vê kesayetiyê de li pêş e, di heman demê de kevneperest û yekdestdarê deshilat, aborî û sermayê ye. Ev kevneperestî roja îro bi modernîteya kapîtalîst re bûye yek, xwe berdaye çaviyên civaka Başûrê Kurdistanê, nirx û exlaqê gelekî aniye ber têkçûnê. Bi riya plangerî, pereyan, keysbaz (firsetçî) deshilata nerewa, bazirganîkirin û tundî û tîjiyê van karan dikin. Ji xwe re rewa dibînin ku bi her nirx û bihayiyên gel bileyîze. Di bin navê “xayîne”, “li dijî kurdayetiyê ye”, “li dijî me ye”, mirovên herî welatparêz, kurdên bê guneh kuştine. Bi riya kolekirina ji dewletên mezin re dixwaze xwe mezin bike û hemû rê û rêbazan ji bo xwe rewa dibîne. Her tiştî dipejirîne ku di xizmeta binemala wî de be, nirx û bihayiyên civakê di oxira binemala wî de ne.

### Hêzên PDK’ê xiyanet li civaka Êzidî kir

Di dema dagîrkirina beşekî zêde ji axa Êraq û Başûrê Kurdistan ji aliyê DAIŞ’ê ve, bi taybetî Mûsil, Şengal, Enbar, Hewîce û beşek ji Diyale, hevsengiyan bi temamî guherî. Bi taybet komkujiya Şengal ya 3 Tebaxa 2014’an ku têde bi hezaran jin û zarok dîl ketin destê çeteyên DAIŞ’ê ku ev karesat, tirajediya herî dijwar e di sedsala 21`ê ku rastê jinê kurd tê û PDK’ê li hember vê rewşê berpirsyar e. Jiber ku hêzên wê îxanet li Êzîdiyan kirin û reviyan û wan bê parastin hêştin. Di encama êrişa hêzên PDK’ê jibo ser Şengal “Nazê Êzîdî” endama Tevgera Jinên Êzidî û rojnamevan “Nûjiyan Erhan” şehîd bûn ku ev jî lewt û lekeyekî reşe li ser eniya PDK’ê. Her çi qasa jî jiber zexta rêxistin û kesêtiyên azadîxwaz, bi berhevkirina ligel yasayên Êraq, hinek proje û madeyasayan li Başûrê Kurdistan bûne biryar, lê piratîze nabin. Yek ji sedemên sereke jî nêzkatiya partiyên deshilatdar ku ew bi rewatî dide eqliyeta zilamsalarî. Kujerîn jin serbest tên berdan û heya niha yasaya pirjinî bi temamî nehatiye qedexekirin. Reşkirin û dijatîkirina jinên siyasetmedar ji aliyê deshilatdarên PDK’ê, rûyekî dinê pîs ya hikumeta Başûr e.

**Ji Pênûsa Jin**

## Jina Êzidî wê çawa xwe biparêz e

**Nehîr Pale**

Kurdên Êzidî di 74 fermanan re derbas bûne, ev komkujî sala 906`an destpê kirin û heyanî 2014`an berdewam kirin e, bi destê qiral, paşa, çeteyên DAIŞ`ê û hêzên dagirker pêkhatin e. Paşayên Osmaniyan di bin navê ol de 51 komkujî li ser Kurdên Êzidî pêk anîn e. Kurdên Êzidî navê ferman li van komkujiyan kirine, ji ber ew ji aliyê erdnîgarî, fikrî, çandî û fîzîkî ve hatine qirkirin. Hêzên dagirker her tim çand û fikrê Kurdên Êzidî li ser xwe xeter dîtine û di her fermanekê de xwestine wan ji kokê qir bikin. Di van fermanan de heman rêbaz li ser jinê dane meşandin. Dema ku êrîşî gund û warên Kurdên Êzidî dikin, mêran dukuje zarok û jinan jî dîl digrin. Jinan xenîmeta şer dibînin û êdî ew milkê wan e. Ew jinên di şer de dîl hatine girtin êdî wan di hemû rewşan de didin bikar anîn. Dema ku dixwazin li gorî temenê wan, bejna wan, xweşikbûna rû û bedena wan, qelewbûn û zeyîfbûna fîzîka wan, nirxên wan diyar dikin û didin bikar anîn. Hemû jinên ku xenîmetên şer in li sûka Nuxasa têne firotin, eger kesek wan nekre tu nirxê wan nîne û wan tavêjin. Bi rêbazên xwe yên qirêj îxanetê li jinê dikin heyanî wê dighînin asta mirin jî bidestê wê nekeve. Ji ber ew jin e îxanet lê tê kirin, Kurd e tu nirxê wê nîne û heyanî Êzidî ye tu mafê wê nîne ku bijî. Bi riya 74 fermanan hewl dan ku dawî li hebûna Kurdên Êzidî bînin. Kurdên Êzidî û bi taybet jina Êzidî li hemberî hemû komkujiyan li ber xwe didin. Di komkujiya sala 2014`an de hate belge kirin ku gelek jinên Êzidî ji bo nekevin destê çeteyên DAIŞ`ê dawî li jiyana xwe anîne. Ji bilindahiya çiyayê Şengalê xwe tavêjin û dawî li jiyana xwe tînin. Dema ku dîlketine destê çeteyên DAIŞ`ê li ser xwe qebûlnekirine û di wextê firset dîtine xwe çekirine çeman an jî bi awayekî dawî li jiyana xwe anîn e. Jinên Êzidî di fermanan de mirin ji xwe re çareserî dîtine.
Kurdên Êzidî ji ber ku Êzidî ne, di ol û çanda xwe de ji civakên dîtir cûda ne, nebûne Misilman her tim hêzên desthilatdar ew di komkujiyan re derbas kirine. Di encama polîtîkaya dagirkeran de civaka Kurd ticarî Kurdên Êzidî qebûlnekirine, ew dûrî xwe hiştine û xwedî li wan derneketine. Jina Êzidî piştî komkujiya 3`ê Tebaxê 2014`an destpêkir xwe birêxistin kir. Êdî bi rêbazên berê xweparastin têrê nake. Rêxistinkirin, têkoşîn, perwerde, aliyê leşkerî, siyasî, dîplomasî, aborî û hwd. Xwe pêşxistin rêbazên xweparastinê ne. Jina Êzidî eger bixwe xwe birêvebibe û pişta xwe nede tu kesî wê bikaribe xwe ji komkujiyan biparêz e. Li hemberî êrîşên hundir û derve bibe xwedî helwest û berpirsyartiya xwe rabike. Çend caran dema ku PDK`ê xwest têkeve hinek gund û warên Şengalê de jinên Êzidî li hemberî wan bûn xwedî helwest.
Mirin ji bo jinê ne parastine, xweparastin bi têkoşînê tê kirin.



# Ji çiraxên hunera kurdî

**Can Yûsif**

Hunermend Cemal Tîrêj Stûneke hunerî ya bilind û bejneke têkoşînê ya bêhempa. Hunermend Cemal Tîrêj ku yek ji stûnên hunera Kurdî li Cizîrê tê hesibandin, ji ber ku wî berhevokek mezin ji berhemên hunerî yên bedew û xweşik pêşkêş kiriye ji stranên şoreşgerî û welatparêzî û awazên bi coş ên hêja ku ji hêla stêrên hunerî yên Kurd ên mezin ve hatine gotin, di rêya wê de pişdarîkir di dewlemendkirina xezîneya hunerî ya neteweyî, û jê re bingehek berfireh ji heyran û hezkiriyên hunera xweş bi dest xist.
Hunermend Cemal Tîrêj bi awaz, dengê xwe û mîrateya xwe ya hunerî di navbera duh û îro de bilind radiweste û ya ku bêhna rabirdûyê bi henaseya îroyîn re dike yek.
Hunermendek ku ala huner û stranbêjiya kurdî hilgirtiye ser milê xwe , nifş li li ser hezkirina wî kom dibin û wî dişopînin û berhemên wî dinirxînin , dema ku tu li dengê wî guhdar dikî tu dihesî ku mûzîk di tamarên wî de digere.
Dibe ku hûn helbestê ji wî nebihîzin dema ku ew li ser wê diaxive, lê hûn wê bi dengê wî yê nazik de , di pêlpêlokên dengê wî yê xweş de û di destpêdanên tiliyên wî yên ku li ser têlên tembûrê direqisin, hûnê bi xweşbûna afirînereke hunerî ya bêhempa pê bihesin .
Hunermend, stranbêj, muzîkjen û rojnamevanê kurd Cemal Tîrêj di 31.12.1957’an de li gundê Sekman El-Elî yê nêzî bajarê Tel Birakê, di nav eşîra Ereb ya Cebûrî de ji du dê û bavên Kurd (Nayîf Heso û Behiya) hatiye dinya yê ,ew kurê helbestvanê kurd ê nemir navdar Seydayê Tîrêj e.
Hunermend Cemal Tîrêj di nav malbateke neteweyî ya kurd ya oldar de mezin bûye ku kevneşopiyên civaka kurdî, nirxên wê yên neteweyî û mîrata gelêrî ya resen ên kurdî diparastin .
Tevî ku ew li gundekî Ereban dijiyan jî, dê û bavên wan ji bo parastina mîrata xwe ya çandî, dîrokî û netewî û ji bîrnekirina zimanê dayikê, ew neçar dikirin ku bi zimanê Kurdî biaxivin.
Dibistana seretayî li dibistana gundê Sekman El-Elî xwend û piştî wê di sala 1970’an de bi tena serê xwe koçî bajarê Hesekê dibe ji bo berdewamkirina
xwendina xwe ya amadehî û lîse bi dawî bîne û piştre malbata wî di sala 1973’an de li dû



wî çû li bajarê Hesekê - Taxa El-Ezîziye niştecî bû.
Xwendina xwe ya amadehî û lîse li dibistanên bajarê Hesekê berdewam kir û li wir bêtir fêrî adet û kevneşopiyên civaka kurdî bû ,bi saya bavê xwe (Seydayê Tîrêj) wî gelek hunermendên kurd nas kirin, wek (Seîd Gabarî, Ebdulqadir Silêman, Faris bavê Fîras û gelek hunermendên din) ku ji bo guhdarîkirina helbest û awazên wî gelek caran mêvandariya bavê wî dikirin bi rengekî rojane.
Bavê wî gelek helbest ji peyv û awazên xwe pêşkêşî hunermendên Kurd kirine, ji wan hunermend Seîd Gabarî, wek (Strana “Bilbilê Dil Şadî”, “Stranek li ser şehîd Leyla Qasim û yek li ser Pêşmergeyan...”).
Meyla wî ya hunerî û muzîkê di temenê xwe yê biçûk de, di şeş saliya xwe de dest pê kir, dema ku ji ezgehên “radyoyên” kurdî yên (Êrîvan, Bexda, Qesr Şêrîn, Kirmaşan, Qahîre û hin din) stranên gelêrî yên resen ên kurdî dişopand û di rêya radyoya bavê xwe li stranên hunermendên kurd yên mîna (Kewîs Axa - Tahir Tewfîq - Seîd Hemo - Hesen Cezrawî, Elî Merdan, Hesen Zîrek û gelek hunermendên din guhdarî dikir) û herwiha li stranên erebî jî guhdarî dikir
Ew gelekî di bin bandora wan de ma û ji wê demê ve huner di damarên wî de diherike.
Di sala 1979’an de bi lêdana tembûrê û stranbêjiyê dest bi karê hunerî dike û di sala 1980’an de bi çend hevalên xwe re beşdarî damezrandina Koma Şoreş ya hunerî dibe û wan Newroza wê salê li çiyayê Kewkebê sê rojan li pey hev pîroz kirin, tevî zext û fişarên ewlekarî û nehiştina rejîma Sûriyê ku di wê demê de pîrozbahiyên netewî yên Kurdî bên pîrozkirin.
Di sala 1981’an de li gundê Gebezê yê navçeya Dirbêsiyê Newroz pîroz kirin.
Di sala 1982’an de li çiyayê Kewkebê Newroz pîroz kirin bi beşdariyeke berfireh a gel, di heman salê de ji aliyê Navenda Çand û Hunerê ya Sûriyeyê ve li Hesekê hatin vexwendin ku bi navê koma Şoreş beşdarî festîvala hunerî bibin.
Di sala 1984’an de ji ber şert û mercên zehmet ên jiyanê, neçar ma ku bajarê xwe Hesekê biterikîne û biçe paytexta Sûriyê Şamê û li wir hunermendê nemir Kanîwar nas dike û bi wî re tevlî koma Azadî dibe û du salan tê de dimîne.
Di sala 1985’an de li ser vexwendina fermî ya Tevgera Rizgariya Kurdistanê diçe Lubnanê û li gel rêhevala şehîd Hozan Mezgîn û Serdar Dêrsim beşdarî pîrozbahiya Newrozê dibe.
Di sala 1986’an de ji aliyê Hunerkomê ve tê vexwendin ku tevlî Koma Berxwedan bibe, ji ber wê jî diçe Ewropayê û tevlî Koma Berxwedan dibe û li gel stêrkên mezin ên hunera Kurdî mîna (Xelîl Xemgîn, Hozan Mezgîn, Diyar Dêrsim, Xemgîn Bîrhat ,Zozan, Serdar , Şemdîn û h.w......) Li pirraniya welatên ewropî beşdarî çalakiyên hunerî û çandî dibe .
Wî li gel HUNERKOM li Ewropa yê bi dengê xwe yê zelal , bi awazên xwe yên xweş û bi stranên xwe yên hêja şahî û ahengên neteweyî û helkeftên niştimanî heşt sal û nîvan li dar xistine, ew xwedî dîrokek bedewe bi hunermendên mezin re ên ji serdema borî de.
Di sala 1994’an de dîsa vedigere Rojavayê Kurdistanê ji bo bikaranîna erkên xwe yên netewî, hunerî û pîşeyî di nav gelê xwe de di warê ragihandinê de ji bo vejandina mîrata netewî ya Kurdistanê bi cih bîne di yekemîn kanala kurdî ya satelîtê MED-TV de wek rojnamegerekî bi derhênerê şehîd Xelîl Dax re di bernameya “Kamera me li mala we ye” dixebite ku şêst xelek jê hatin weşandin, xeleka yekem di 4/5/1995 de hate weşandin.
Ji xebat û berhemên wî yên hunerî û çandî, HUNERKOM du albûmên wî yên stranên şoreşgerî û welatparêzî li Ewropayê derxistine ku piraniya wan ji gotin û awazên wî bûn.
1- Albûma Yekem bi navê Serîhildan di sala 1989’an de hatiye weşandin.
2- Albûma duyemîn bi navê “Sînor” di sala 1992’an de derketiye.
Di sala 1997’an de bi alîkariya hunermend Şiyar Agirî û hunermend Lazgîn Xalid albûma xwe ya sêyem ya bi navê “Destan” li Rojavayê Kurdistanê derxistiye.
Herwiha bi stran û awazên xwe ligel Koma Berxwedan di albûmên wê de, bi zêdetir ji panzdeh stranan beşdar bûye.
Ji stranên wî yên herî navdar:
- Here Em Bi Tere
-Silavê Dila
-Digerim Bo Vî Dilî
-Amad Paytexte
- Sînor
-Serhaldan
-Yarê.
Cemal Tîrêj kesayetiyek hunerî ya neteweyî û afirîner tê hesibandin , ew bi nivîs, awaz û stranên xwe di dewlemendkirina huner û çanda Kurdî de xwedî roleke berçav e û di warê ragihandina netewî de li ser kanalên satelaytên Kurdî de xwedî dîrokeke dirêj e.
Piştî ku ji sala 1994’an ve vegeriya Rojava, ew wekî çalakvanekî ragihandinê , peyamnêrê telvezyonê, amadekar û pêşkêşvanê bernameyên televîzyonê bênavber dixebite , ji kanala Med TV dest pê kir û pêre derbasî kanala Mediya TV, Mezopotamya, Roj TV, Ronahî TV û Rojava TV bûye, ji roja destpêka weşana têsta Ronahî TV heta roja me ya îro li ser ekranê Ronahî TV dixebite û gelek bernameyên hunerî û çandî pêşkêş kiriye.
Ji yekemîn bernameyên wî yên hunerî û wêjeyî ku di Ronahî TV de pêşkêş kiriye “Bernameya Orkêş” bû û piştre jî Bernameya “Şevîn” û niha jî Bernameya “Stranên Welat”. Herwiha bernameya “Dengbêj” jî li ser ekranên kanala Rojava TV pêşkêş dike,hemû jî bernameyên hunerî, wêjeyî û çandî ne, û armanca wan jî vejandina folklor û mîrata kurdî, ronîkirina jiyannameya hunermend û helbestvanên kurd ên nemir û teşwîqkirina nifşê nû û piştgiriya wan di karên hunerî û wêjeyî de ye.
Di nava Şoreşa Rojava de ji bilî xebatên xwe yên ragihandinê gelek stranên şoreşgerî li ser Hêzên Parastina Gel û Jin, Şoreş û Efrînê derxistine û belav kirine.
Dîroka wî ya têkoşane û şoreşgerî û xebata wî ya hunerî û niştimanperwerî pir dewlemend e, tiştê ku min li ser jiyanname û çalakiyên wî yên hunerî nivîsandine , ew xalek ji deryaya wî ne , ji ber ku ew çavkaniyek tucarî kêm nabe , ew solîneke diherike qet zuha nabe û dîrokek tejî ye ji têkoşîna domdar û dayîna berdewam e...
Di karê wî yê hunerî de saxlemî, serketinên zêdetir, geşbûn û afirîneriyê dixwazim.

**Têbînî**



## Demsala Çapkirina Pirtûkan

**Kemal Necim**

Dibe ku ev sernivîs hinek balkêş be û pirsekê di mêjiyê mirovan de çêbike, ka gelo demsala çapkirina pirtûkan jî heye?
Bi dehên salan li seranserî cîhanê karên çapkirin û weşanê bûbû pîşeyeke pir girîn, qadeke hilbirînê ya berfereh û jêdereke darayî ya mezin. Lewma xebatên weşangeriyê ji bilî girîngiya wê ya pêşxistin û hilbirîna raman û zanistê her wiha bûye qadeke pîşeyî ya sereke.
Bi pêşketina teknolojiyê û derketina alavên hevgihînê re, pêdiviya kesan bi weşanên çapkirî kêm bû, lewma dihate gotin ku êdî ev pîşeya çap û weşanê dê mîna pir pîşeyên din tune bibe û nemîne, her wiha girêdayî wê jî dê berhemên çapkirî kêm bibin û bi demê re tune bibin. Lê berovajî hemû pêşbînî û gumanan, ev qad her çû mezintir bû û girîngiya xwe ya pîşeyî winda nekir
Rêxistina Cîhanî ya Mafên Derbirîna Ramanî (WIPO), di slan 2023`an de raporeke bi sernavê “Pîşesaziya Weşanê li Cîhanê” weşand. Li gorî raporê di van du salên dawî de pîşesaziya weşangeriyê geş bûye.
“Di sala 2022’an de dahata giştî ya pîşesaziya weşangeriyê li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê gihîştiye 26,2 mîlyar dolarê Amerîkî, ku dahata herî zêde ya firotinê li wî welatî, li dû wê Almanya bi 9,9 mîlyar dolar, piştre Hindistan. 9.1 mîlyar, û Birîtaniya 5 mîlyar dolar), ev dane dide diyarkirin ku paşeroja vê pîşesaziyê geşbîn e, û dikar bi gelek awayan xwe biguhere û geş bibe.
Her wiha li gorî hin daneyan pîşesaziya çêkirina pirtûkan ji pîşeyên din yên hilbirîna medyayê mezintir e, û dahata wê ji dahata çêkirina fîlman û mûzîkê jî bêhtir e.
Bê guman ev dane û hijmar li gorî dewlet û civak û herêman tê guhertin, lewma ev pîşe li pir welatan hîna qels e û nebûye jêdera dahata darayî ne jî dahata ramyarî û zanistê.
Em vegerin sernivîsa xwe (Demsala Çapkirina Pirtûkan).
Weke tê zanîn ku çanda kurdî bi giştî li Rojava di bin nîrê qedexe û çewisandinê de bû, lewma li Rojava hetanî berî 10 salan pîşeya weşangeriyê û çapê tune bû, her wiha bazara wê jî tune bû. Piştî pêşvajoya şoreşê, li gorî derfetên heyî çapxane hatin peydakirin û hin weşanxane jî hatin damezrandin. Bi derketina çapxane û weşanxeyan re hijmara pirtûkxaneyan jî zêde bû, ango em bêjin bingeha bazara çêirin, kirîn û firotina pirtûkan hinekî hate avakirin. Lê ta niha, qada weşangeriyê ne weke qadeke pîşeyî lê belê weke erkekî netewî bo pêşxistin û parastina ziman û çanda kurdî hatiye birêvebirin. Lewma xebatên weşangeriyê bi berdewamî û seranserî salê nayên kirin. Ji xwe weşangerî ji bo saziyên weşanê nebûye jêdera darayî û bazara wê ya geş û şên tune ye. Bazara sereke ya pirtûkan li herêmê heta niha Pêşangeha salane ye ku li bajarê Qamişlo heft salan li pey hev tê lidarxsitin. Lewma piraniya weşanxeneyan û saziyên rewşenbîrî û desteyên çandê ku bi kar û barê çêkirina pirtûkan mijûl dibin, tevahiya salê guh nadin xebatê çap û weşana pirtûkan, tenê berî lidarxistina pêşangeha salane bi çend mehan nû dest bi karê weşanê dikin. Ji ber van sedeman giranî li ser çapxaneyan çêdibe, her wiha ji ber karên bilez çaweniyan pirtûkan jî pir caran nebaş derdikeve.
Piştî du mehan tê payin ku 8`mîn pêşangeha Şehîd Herekol ya pirtûkan bê lidarxistin, lewma em niha ketina Demsala Çapkirina Pirtûkan.

# ‘Siyaseta Îranê ya li dijî jinan siyaseta qirkirin û pişaftinê ye’

Rêveberiya Komeleya Mafê Mirovan ya Kantona Cizîrê Evîn Cuma bang li hemû rêxistinên navneteweyî û tevahî saziyên mafên mirovan kir ku li dijî cezayê darvekirina Şerîfe Muhammedî û Pexşan Ezîzî ku ji aliyê rêjîma Îranê ve hatiye birîn, dengê xwe bilind bikin.

**Birûc Resûl/Qamişlo**

Desthilata Îranê xwepêşandanên ‘Jin, Jiyan, Azadî’ ku piştî jina Kurd a Îranî Jîna Emînî di Îlona 2022’an de dema di binçava Polîsê Exlaqê de bû û di encamê de bi sedan kes hatin kuştin û bi hezaran xwepêşandêr hatin girtin, di cîhanê de Îran dewleta herî ku cezayê darvekirinê pêk tîne.

Rêxistina Mafên Mirov a Îranê di daxuyaniyek de ragihand, ji roja 18’ê Tîrmehê ve rejîma Îranê li seranserî girtîgehên Îranê 27 kesan bidarvekiriye. Kesên ku hatine bidarvekirin Piraniya yên wan Kurdin û di nava de 4 jî jin in. Di heman demê de Rêxistinên mafê mirovan eşkere kir ku ji serê salê ve jî 293 kes li bajar û navçeyên cûda yên Îranê hatine bidarvekirin û piraniya wan jî Kurdin.

Derbarê siyaseta desthilata Îranê ya darvekirinê Rêveberiya Komeleya Mafê Mirovan ya



Kantona Cizîrê Evîn Cuma ji Rojnameya me axivî.

Evîn Cuma di destpêka axaftina xwe de wiha got: “Bêguman rêjîma Îranê di dîroka xwe ya demdirêj de heya roja me ya îro siyaseta xwe ya darvekirinê bi her şêweyî li hemberî çalekvanan dewam dike. Ji xwe tê zanîn pergala rêjîma desthilatdar ya Îranê li ser bingeha tunekirina jinê hatiye avakirin, ew bi zihniyeta zilamê serdest zagonan didine avakirin. Di heman demê de jî di vê hefteyê de jimareke mirovan hatin bi darvekirin û mehkûmî mirinê hatin kirin. Di roja me de jî gelek mînakên ber bi çav hene ku Jîna Emînî dixwest bi nasname Jintiyê û di heman demê de bi



cil û bergên xwe yên resen xwe bidê pêş, lê ev bû sedem ku rêjîma Îranê ji bona domadina pergala xwe xeteriyek mezin bibîne. Ev binpêkirin bi temamî socekî li dijî mirovahiyê ye, her wiha nabe ku kes helwesta xwe nîşan nede.”

**Pergala Îranê Ya darvekirinê**

Evîn di berdewamiya axaftina xwe de balkişand ser biryara darvekirina çalekvanên kurd Bexşan Ezîzî û Şerîfe Mihemedî û wiha got: “Ger em li dîroka mirovahiyê bi renegekî rast meyze bikin, rêjîma Îranê ya destheledar bi darvekirina mirovan bi tenê ji bona fikirê wan bûn, çi mirovekî ku piştevaniya fikirê xwe dikir ji hêla pergalê ve dihate darvekirin. Di vê dema dawî de çalekvana kurd Bexşan Ezîzî û Şerîfa Muhemedî bi awayekî tund nerazîbûna xwe li hemberî pergala mêr dane nîşandan, li dijî wan biryara cezayê darvekirinê li ser wan hatiye birîn û bi mirinê re rû bi rû mane. Li Rojhilatê Kurdistan û li Îranê bi taybet çi kesekî rabe ji bona mafê xwe dengê xwe bilind bike, têne bin çavkirin û cezayên herî giran di derbarê wan de têne dayîn. Ne tenê bi vî awayî sîstema işkencê gelek xwort kirine. Ji lewra siyasta ku dewleta Îranê ya di derbarê Jinê de digre bi temamî siyaseta tunekirin û inkarê ye.”

**‘Banga me ji hemî Rêxistinan’**

Rêveberiya Komeleya Mafê Mirovan ya Kantona Cizîrê Evîn Cuma di dawiya axaftina xwe de wiha got: “Em bang li rêxistinên navneteweyî û tevahî saziyên mafên mirovan dikin ku cezayê darvekirinê yê li çalakvan Şerîfe Muhammedî û Pexşan Ezîzî hatiye birîn, demildest were rawestandin. Her wiha banga ji tevahî jinan re ew e ku li hemberî cezayên darvekirinê helwesta xwe nîşan bidin û daxwaza maf û azadiya xwe bikin.”

# ‘Bingeha çand û hunera her netewekê, zimanê wê ye’

**Navenda Nûçeyan**

Hertim çand û zimanê gelê Kurd bûye hedefa dewleta Tirk a dagirker ku hewla tunekirin û şêwedanê dide. Şîrîn Ednan got: “Bingeha çand û hunera her welatekê li ser zimanê wê hatiye danîn. Her wiha em dikarin bi rêya perwerde û fêrkirinê zarokan fêrî parastina çanda xwe bikin.”

Ziman, çand û kevneşopî yek ji prensîbên sereke yên naskirina hemû neteweyên cîhanê, naskirina urf û adetên neteweyên herêmê tê dîtin. Gelê Kurd jî ji wan netewên ku xwedî dîrok û çandek kevnare. Di warê çandî de xwedî dewlemendiyek mezine, lê ji ber bandora çanda biyaniyan û hewldanên welatên dagirker di bin metirsiya windabûnê deye.

Herî dawî li Bakurê Kurdistanê bi awayekî eşkere û vekirî, dewleta Tirk a dagirker gelek ciwanên ku govenda Kurdî gerandîn, li gelek bajaran hatin binçavkirin. Her wiha nivîsên Kurdî yên li ser cade û kolanan heyî hatin reşkirin yan jî rakirin. Vê yekê bertekek mezin di pey xwe de anî. Di derbarê parastin û berdewamkirina çand û zimanê resen yê Kurdî de, Çalakvan û xwendevana beşa zimanê Kurdî li Zanîngeha Silêmaniyê Şîrîn Ednan ji Rojnews’ê re axivî.

**‘Rolek giring a jinan di fêrkirina giringiya çand û hunera Kurdî heye’**

Şîrîn Ednan di destpêka axaftina xwe de qala giringî û parastina çand û folklora neteweyî kir û wiha got: “Bingeha çand û hunera her netewekê zimanê wê ye ku tê de bîr û bawerî, têgihîştin, cil û kevneşopiyên bi wî neteweyê ve girêdayî ye. Jin dayikin û erkê wan perwerdekirine. Lewma di perwerdekirina zarokên xwe û naskirina çanda neteweya xwe de roleke girîng dilîzin û wan bi reftarên Kurdî perwerde dikin û wan fêrî zimanê Kurdî dikin. Jin di parastina çand û nasnameya me ya Kurdî de rola xwe dilîzin. Vê yekê jî taybet bi lixwekirina cil û bergên Kurdî re dikin. Cihê keyfxweşiyê ye ku hîna jinên ku cil û bergên Kurdî yên resen li xwe dikin û zindî dihêlin, hene.”

**‘Bi rêya perwerdekirinê, em dikarin zarokan fêrî parastina çanda Kurdî bikin’**

Xwendevana beşa zimanê Kurdî ya li Zanîngeha Silêmaniyê Şîrîn Ednan wiha axaftina xwe domand: “Gelê Kurd di warê ziman de xwedî çandeke dewlemende. Her wiha gelek peyv, zarava û cil û bergên taybet hene. Lewma divê em vê yekê ji bîr nekin. Em dikarin zarokên xwe fêrî parastina vê çand û kevneşopiyên Kurdî bikin. Roleke girîng ya jinan di parastina çand û zimanê me de heye. Ji ber ku em dema ji dayîk dibin em ne xwediyê ti ziman û çandêne. Divê bi me bidin fêrkirin. Erkê saziyên perwerdeyê yên hikûmetê ye ku hewl bidin çanda me ya netewî biparêzin û rê li ber tunekirina wê bi rêya saziyên perwerdehiya zarok û ciwanan a dewletî û nehikûmî bigrin. Da ku nifşên me yên pêşerojê bi ziman, çand û hunera Kurdî ji zarokatiyê ve jî bên naskirin.”



**‘Zimanê dayîkê beşek ji dîrok û nasnameya mirov e’**

Çalakvana Silêmaniyê Şîrîn Ednan qala bandora ziman û çanda biyanî li ser çanda Kurdî kir û wiha pê de çû: “Mixabin piraniya dê û bavan zarokên xwe dişînin dibistanên taybet da ku bi zimanekî din biaxivin. Ev yek jî zimanê Kurdî yê zarokê lawaz dike. Divê berî her tiştî her zarok fêrî zimanê xwe yê dayikê bibe û ji zimanê xwe hez bike. Zimanê me yê dayîkê jî Kurdiye. Piştre em dikarin hewl bidin ku zarokê xwe fêrî zimanê duyemîn bikin. Ji ber ku zimanê dayîkê di rêza yekem de beşek ji nasname û dîroka me ye. Xwedî rolek giringe ku bi wê yekê dîroka netewa mirov tê nasîn.”

Şîrîn Ednan da zanîn ku gerdûnîbûn bandorek mezin li ser tinebûn û wêrankirina çanda her neteweyekê dike, ku bandorek mezin çêkiriye û wiha got: “Yek ji wan bandoran jî ragihandine ku dikare şûna van fîlm û bernameyan bigire. Divê berhemên Kurdî yên ku karakter û mohra Kurdî li xwe digrin biweşînin û giringiyê bidin berhemên nivîskar û helbestvanan. Her wiha divê di bikaranîna medya dijîtal de zêdetir giringiyê bidin bikaranîna peyvên Kurdî.”



# ‘Gelê Mexmûrê Ne Koçberê Nan û Avê ne, Penaberê Azadiye ne’

10 sal beriya niha dema çeteyên DAIŞ’ê berê xwe dabûn Hewlêrê û heta navçe û wargeha Mexmûrê hatibûn, gerîlayên HPG/YJA-STAR, li gel hêzên parastina wargehê berxwedaneke mezin nîşan dabûn û cara yekem bû ku çeteyên DAIŞ’ê têk diçûn.

**Argêş Gewda/Qamişlo**

Di derheqê salvegera êrîşên hemdemî yên ser Kampa Şehîd Rûstem Cudî û Şengalê, hevseroka Meclîsa Gel ya Kampa Şehîd Rûstem Cudî ya Mexmûrê Fîlîz Budak pirsên rojnameya me bersivandin û naveroka hevpeyvînê wisa bû:

**-Sedemên êrîşên dagirkerîyê yên ji aliyê çeteyên DAIŞ‘ê û dewleta Tirk ya dagirker ve yên li ser Mexmûrê çi ne?**

Di sala 1990 û 1992’an de hêzên hegemon yên herêmê şerê wekaletê dan destpêkirin. Hêzên hegemon û desthiladar ev şere ji bona bikarin mêtîngerîya xwe xurt bikin, dane destpêkirin. Armanc ew bû ku ev hevpeymana Lozanê ya ku 100 saliya xwe dagirt bikarîbin nû bikin. Girêdayî wê armancê komên çete yên cûda dan avakirin. Mebesta van hêzan Rojhilata Navîn metîngerîya xwe pêş xistin bû. Zêdetirîn welatên ereban ev komên çete dan avakirin, armanc dikirin ku vê projeyê di Rojhilata Navîn bidin tevgerkirin. Di wan plansaziyên metîngeriyê de, di sala 2014’an de DAIŞ hat rêxistinkirin û şandin welatên Rojhilata Navîn. Bi wan êrîşan gelê kurd kirin armanc û hewildan bi destê komên çeteyan Kurdan qir bikin. Di dîroka 3’ê Tebaxa 2014’de hem êrîşê Şengalê, 6‘ê Tebaxa heman salê da jî êrîşê Kampa şehîd Rustem Cudî ya



Mexmûrê hat kirin. Di aliyê çeteyên DAIŞ‘ê ve Musil Kerkûk û Bexda hatibû dorpeçkirin, ji bona ber bi Hewlêrê ve biçin. Yê ku ev çeteyana aliyê aborî de xwedî dikirin û fînanse dikir yek jî wan dewleta Tirk ya dagirker bû. Ji ber ku Kampa şehîd Rustem Cûdî cihê penaberên di sala 1994‘an de ber bi zext û zordariya dewleta Tirk koçber bûne û dest doza ramanên Rêber Abdullah Ocalan bernedabûn bi wan pêk dihat. Ji ber wê taybet armanc hat girtin, komên çeteyên DAIŞ‘ê ve hewildan ku dagir bikin. Kampa Mexmûrê di aliyên ramanên Rêber Apo da pergalek dabûn avakirin. Netewa demokratîk ya ku bi paradigmaya Rêber Abdullah Ocalan re tê rêvebirin. Zarok û ciwanên kampê bi zimanê xwe û dîroka xwe dihatin perwerde kirin. Armanca êrîşên DAIŞ‘ê bi taybet têkbirina pergala Netewa Demokratîk bû. Van koçberan nêzî 30 salan dan xuyakirin bê ku dewlet hebe, bê ku desthilatî hebe, gel dikare bixwe xwe rêve bibe. Aliyê xwe parastinê jî niştecîhên kampê hem hêzên wan yên erka xweparastinê, Gerîlayên Tevgera Azadîyê bi hev re ji bona aramî û parastina kampê xebat dikirin. DAIŞ‘ê şikestina xwe ya yekem li Mexmûrê jîyan kir. Ji ber wê ye dewleta Tirk ya dagirker êrîşên xwe didomîne.

**-Li hemberî wan êrîşan helwesta gelê Kampa Şehîd Rûstem Cudî di çi astê de bû, li ser asta cîhanî çi hemberî êrîşên DAIŞ‘ê hat dayîn?**

Peyama ku li hemberî êrîşên çeteyên DAIŞ’ê hatiye dayîn ev bû ku çi bibe, bila bibe gelê Kampa şehîd Rûstem Cudî rê nade komkujîya, rê neda ku çeteyên DAIŞ’ê kampê dagir bike. Ev fermana ku Şengalê hatiye jîyan kirin, Mexmûrê wê bi çavê xwe dît û bû şahidê buyerê. Rêxistinên ku Mexmûrê kar û xebat dimeşînin Meclisa Gel, Meclisa Jin û Meclisa Ciwana peyamên ku pewîst dane raya giştî û cîhanê. Gelê Mexmûrê got ku çi bibe bila bi ew radestî dagirkeran û çeteyan nabin. Em rê nadin komkujiyan bi ti şêwazî. Ser wê bingehê roja 6’ê Tebaxa 2014’an zarok, kal û nexweş kampê hatin derxistin û birin cihê bi ewle. Weke din ciwan û jinên Mexmûrê, milîsên kampê û Gerîlayên HPG’ê bi hevra li hemberî çeteyên DAIŞ‘ê berxwedanî kirin û tekoşiyan. Şerê DAIŞ’ê şerekî hişmendiyê bû. Armanca DAIŞ’ê ya sereke ser jina Kurd serdestî pêş xistin bû. Ev plansaziyên wan hêzên veşartî bi piştgrîya dagirkerên Tirk berûvajî zivirîya û di alîyê tekoşîna jinên bi ramanên Rêber Abdullah Ocalan xwe perwerde kirî, hat bersivandin. Şerê ku hatiye meşandin şerê li hemberî koletiyê dayina azadkirin bû. Piştî wê berxwedanê pêşî li dagirkirina Hewlerê dagirkirina Bexda hat girtin. Şikestina DAIŞ’ê bû peyamek mezin jibona metîngerên din yên her 4 parçeyên Kurdistanê.

**- Gelê Mexmûrê bi berxwedaniya xwe li ser asta Rojhilata Navîn Çi peyam da?**

Gelê Kurd li hemberî desthilatdariyê û hemberî koletiyê ti cara serê natewîne. Ev peyam pir cara dabû heremê û piştê şikestina DAIŞ’ê hemû cihanî ev tişt baş fêm kir. Netewa Demokratîk ya bi pêşengtîya Rêber Abdullah Ocalan hatiye pêş xistin de, bû mînak jibona gelê herêmê û Rojhilata Navîn giştî. Gelê herêmê Rêber Abdullah Ocalan wek Rêberê Netewî bi nav dike. Ev peyame jî derket hole ku bi aliyê welatîyên Kampa Mexmurê ‘Em ne koçberê nan û ax bûn em koçberê azadîyê û wekheviyê ne’. Ev tişt jî mîsoger bû ku civakek ku rêxistinkirî be û ferqa wê hêza xwe de be ti kes nikare wan têk bibe. Nifşên Civakê ku ser dîroka xwe û ser felsefa xwe bê mezin kirin û perwerde kirin encam hertim serkeftin e. Rêber Apo bi keda salan Kampa Mexmûrê perwerde kir û kir civakek ku bikare xwe birêve bibe. Gel ev peyama dan Iraqê û Rêveberîya PDK‘ê bi ew qas derfet û teknîka destê we, nedikarî hûn gel biparêzin û heya dawiyê em jiyana azad û bi rûmet de israr dikin.

**- Bi salvegera êrîşên li ser Kampa Şehîd Rûstem Cudî ya Mexmûrê, peyama we çi ye?**

Sedema salvegera êrîşên DAIŞ‘ê yê ser Kampa Şehîd Rûstem Cudî de, bi kesayeta şervana YJAStar û endama ragihandina azad Şehîd Denîz Firat, Siyabend, Avesta û Dîyar de hemû şehîdên Kurdistanê bibîrtînin û bejna xwe li ber wan tewînin. Wan hevalan, jibona gelê Mexmurê û Başûre Kurdistanê cane xwe kirin mertal û xwe feda kirin. Ev pakrewana şopek ser dilê gel û civakê hiştin. Şer hîn berdewame. Çeteyên DAIŞ’ê şikestin lê xeterî hîn berdewam e. Dibe bi naveke din dîsa êrîşêkê li ser kampê bikin. Bi 100’an caran dewleta Tirk ya dagirker êrîşê kampê kirin, gelek welatî şehîd kirin û pir kes jî birîndar bûn. Hîn metirsiyek ser gelê herêmê didome. Li hemberî wan gef û êrîşan hêzên nawnetewî weke Neteweya Yekbuyî (NY) bê denge. Kampa Şehîd Rûstem Cudî bin sîwana NY‘ê ava bûye lê NY xwedî erk û berpirsyarîya xwe dernakave. Bangawazîya me jibona sazî û komaleyên nawnetewî komaleyên jinan û zarokan dibe taybet jibona Fermana li ser gelê me yê Êzîdî û Kampa penaberan ya şehîd Rûstem Cudî hatiye meşandin de xwedî helwest bin.

# Dewleta Tirk 9 baregehên nû ava kirin, 184 malbat koçber kirin

**Tenê divê êrişa dagirkeriyê ya herî dawî ya dewleta Tirk a dagirker a li ser parêzgeha Dihokê de 184 malbatan warên xwe û nêzî 830 donim zevî û baxçeyên xwe bi neçarî terikandin. Li gel vê yekê jî ji aliyê artêşa dewleta Tirk a dagirker ve 9 baregehên leşkerî hatine avakirin .**

Êrişên dewleta Tirk a dagirker yên ji bo dagirkirin û îlhaqkirina beşek ji xaka Başûrê Kurdistanê didomin. Welatiyên xwecihî yên gundên parêzgeha Dihokê bi bombebaranên ji hewa û êrişên ji bejahiyê ve neçar kirine ku malên xwe biterikînin.

Di 15’ê Hezîrana îsal de, artêşa dewleta Tirk a dagirker bi hezar leşker, 300 tank û wesayîtên zirxî li dijî sînorê parêzgeha Dihokê êrişek nû a berfireh ya dagirkeriyê da destpêkirin. Ev êrişên dagirkeriyê bû sedema gelek karesatên mirovî û jîngehî. Ajansa me Rojnews’ê di vê raporê de daneyên valakirina gund û malan, bombebarankirina cihên niştecihbûnê û avakirina baregehên leşkerî yên artêşa Tirk a dagirker eşkere dike.

Tenê di vê êrişa dagirkeriyê ya dawî de 184 malbat li parêzgeha Dihokê neçar mane ku malên xwe biterikînin. Lê belê ev malbat ji ber erdnîgariya herêma xwe xwedî rez û baxin, eger em ji bo her malbatekê bi qasî 4-5 donim zeviyên ji rez û bax hesab bikin, dike bi qasî 830 donim zevî ku çavkaniya bi dehan fêkî û zebzeyane.

Dewleta Tirk her wiha tenê di vê êrişa xwe ya zêdetirî du mehin li ser Başûrê Kurdistanê dewam dike 19 mal, 2 dibistan, kargehek ard, otomobîlek, dêrek û 2 projeyên ava vexwarinê jî bombebaran kirine. Tenê di van êrişên dagirkeriyê yên dewleta Tirk de, gundên Mijê, Kevne Mijê, Girgaşe, Spîndarê yên devera Ber Garê, gundê Dêmka yê girêdayî Batîfa, gundê Dergeke, Musabegî, Şêlazê, Bişîlê û Miska yên Kanî Masê yên herêma Berwarî Bala ya parêzgeha Dihokê bi darê zorê hatine valakirin. Bi giştî heta niha 170 gund ji ber êrişên dagirkeriyê yên dewleta Tirk a faşîst hatine valakirin û 602 gundên din jî di bin xeteriya valakirinê de ne.

Her wiha artêşa Tirk a dagirker 9 navendên leşkerî li herêma Behdînanê ava kirine. Bi giştî ji sala 2015’an ve dewleta Tirk li Başûrê Kurdistanê 74 baregehên dagirkeriyê ava kirine.

Ji aliyek din ve alavên ragihandinê û bircên telefonê yên xetên ragihandinê yên dewleta Tirk ji baregehên leşkerî yên dagirkeriyê bandor li xetên ragihandinê yên zêdetirî 110 gundan kiriye.

Derbarê rêjeya şewitîna giya, pûş û daristanan de, li gorî pêşbîniyên rêxistina Amerîkî CPT’yê ku ji anketên bi niştecihên deverên hatine dagirkirin re kirine, tenê di dema van êrişên dagirkeriyê yên dewleta Tirk qirker de nêzî 68



hezar donim erd hatiye şewitandin.

Derbarê daneyên êriş û bombebaranên dewleta Tirk de, her çendî ku daneyek rast li ber dest nîne jî, lê li gorî agahiyên ku ji deverên cuda yên Başûrê Kurdistanê ketine destê ajansa me Rojnews’ê, dewleta Tirk a faşîst zêdetirî 300 caran Başûrê Kurdistanê bombebaran kiriye.

Di êrîşên dewleta Tirk a dagirker de ji destpêka îsal ve heta niha 13 welatiyên sivîl şehîd bûne û 11 welatiyên sivîl jî birîndar bûne. Par jî di encama êrişên dewleta Tirk de 33 welatiyên sivîl şehîd bûn û 22 sivîl jî birîndar bûn. **ROJNEWS**

# Hevserokê KNK'ê: Dem dema yekrêzî û berxwedaniya gelê kurd e

Hevserokê KNK'ê Ahmed Karamus anî ser ziman ku hewldana dewleta Tirk a dagirker ji bo dagirkirina Başûrê Kurdistanê pilaneke sitratejîke û siyaseteke kevnar e û wiha domand: "PDK'ê beşek di pilana dagirkeriyê de ye, ev yek jî xeteriyê li ser hebûna gelê kurd ava dike. Lewma jî dem dema yekrêzî û berxwedaniya gelê kurd e. "

**Reşo Mihemed/ Qamişlo**

Hevkariya PDK'ê bi dewleta Tirk a dagirker re ji bo dagirkirina Başûrê Kurdistanê li ber çavê kurdan tê kirin. Li hemberî vê yekê hemû tevger û partiyên kurdî ji nav wan jî Kongreya Netewî ya Kurdistanê (KNK) xeteriyên tevkariyê li ser hebûna gelê kurd dide destnîşankirin. Di heman demê de hewldan li ser asta kurdistanî ji bo bidawîkirina tevkariya bi dagirkeriya Tirk re û pêkanîna hevrêziya kurd tên kirin. Girêdayî heman çarçoveyê hevserokê KNK'ê, Ahmed Karamus bersiva pirsên rojnameya me da û naveroka hevpeyvînê jî wiha ye:

**-Di dema heyî de dagirkeriya Tirk bi hevkariya PDK'ê axa Başûrê Kurdistanê dagir dike û şerekî bi armanca qirkirina gelê kurd dide meşandin, hûn vê yekê çawa dinirxînin?**

Hewldana dewleta Tirk a dagirker ji bo dagirkirina Başûrê Kurdistanê ne tiştekî nû ye, lê belê pilaneke stiratejîke û siyaseteke Tirkiyê ya bi salan e ku di rojevê de bû. Lê konsebta û rewşa siyasî ya netewî, ya Rojhilata Navîn û Kurdistanê derfet nedida ku dagirkeriya Tirk îro bi vî rengî li Başûr tev bigere. Sedema din jî ew bû ku piştî DAIŞ li ser destê kurdan têk çû û di van salên dawîn de rol û misiyona kurdan û destkeftiyên gelê kurd li Rojhilata Navîn û cîhanê deng veda, êdî dewleta Tirk a dagirker tev geriya. Armanca dewleta Tirk jî têkbirina gelê kurd, Tevgera Azadiyê û destkeftiyên kurdan e. Sedema ku dewleta Tirk bi vî rengî tev nedigeriya jî ew bû ku çendîn caran bi dirêjahiya dîrokê Tevgera Azadiya Kurdistanê derbeyên mezin li artêşa Tirk a dagirker dida û ew neçar dikir ku xwe vekişîne paş. Her wiha derfet jê re çênedibû, lê niha dest bi konsebt û pilana dagirkeriya Başûrê Kurdistanê kiriye û PDK'ê jî mileke di meşandina vê pilanê de. Tişta herî xeternak bi destê PDK'ê tê kirin, ji ber ku ew agahdariyên stratîjîk yê cografîk ya herêmê dide dagirkeriya Tirk û hêza xwe dike rêzan li pêşiya artêşa dagirkeriyê.

**We berî demekê serdana Başûrê Kurdistanê kir, gelo wek KNK'ê çi kar û xebat ji bo hevrêziya kurdî kir û encamên vê serdanê çi bûn?**

Belê berî çend heftiyan şandeyeke KNK'ê ji bo hin mijarên girîng serdana Başûrê Kurdistanê kir û armanc ew bû ku em hevdîtinan bi partiyên kurdî û rêxistinên siyasî re pêk bînin. Ev serdana me serdaneke taybet bû û ji bo diyarkirin û nîqaşkirina hin mijarên xeternak li ser asta niştîmanî. Mijara sereke derbasbûna artêşa Tirk bi tang û xalên kontrolê li ser axa Başûrê Kurdistanê bû, her wiha xeteriya wê li ser hebûna kurdan û girêdana wê bi hewldana dagirkirina Rojavayê Kurdistanê re. Me rêzehevdîtin bi tevahiya partî û rêxistinên siyasî û civakî re pêk anî û nîqaşên berfireh û lihevkirinek di navbera me û wan de li ser xeteriya dagirkeriya Kurdistanê çêbû. Di heman demê de me kir pilana xwe ku çawa rê li ber vê dagirkeriyê bigirin, ji xwe ev yek rol û erkê KNK'ê ye. Me wekî serdanên beriya vê serdanê, bi tevahiya partiyên kurdî re hevdîtin pêk anî, ji bilî PDK'ê ji ber ku bi dijmin re tevkariyê dike em nikarin daxwaza hevdîtinan jê bikin. Eger em daxwaza hevdîtinan jî ji PDK'ê bikin di baweriya me de wê ti encamên erênî di dawiyê de tune bin. Hewldanên me ji bo bidawîkirina tevkariya PDK'ê bi



dagirkeriya Tirk re her di rojevê de ye, li aliyekî din li ser asta niştîmanîkurdistanî jî xebateke bi roj û şev ji bo pêkanîna hevrêzî û yekdengiya kurdî tê kirin. Ji ber ku hevrêziya kurdî riya rast ji bo hebûna netewî û parastina destkeftiyên kurdan e.

**Tevkariya PDK'ê bi dewleta Tirk re çiqasî xeternak e li ser hebûna kurdan û çawa dibe asteng ji bo pêkanîna hevrêziya kurdî?**

Divê berî her tiştî em bînin ser ziman ku PDK'ê li ser asta Başûrê Kurdistanê û parçeyên din yên Kurdistanê bi helwesta xwe, bi îmzekirina peymanan bi dewleta Tirk re, tevkariya dagirkeriya Tirk kiriye. Tevkariya PDK'ê bi dewleta Tirk re jî vedgere dîrokeke kevnar, em dizanin bi salan e ku ew ketiye bin bandora dagirkeriyê. Dewleta Tirk bi dehê salan sazî, kargeh û kompanî li Başûr ava kirine û bi navê danûstandinên abûrî tev digerîne. Di rastiyê de ev kompanî û sazî ji aliyê sîxurtî û îstixbarata dewleta Tirk ve hatine perwerdekirin ji bo ku bikaribin PDK'ê bi hemû şêwazî bixin bin bandora xwe. Ev yek jî pêk hat, PDK'ê tenê şeklî ma, lê dewleta Tirk a dagirker Başûrê Kurdistanê rê ve bir û PDK'ê jî hevkar bû. Ji xwe rewşa ku Başûrê Kurdistanê tê re derbas dibe bi vî rengî ye. Ti kes nikare tevkariya PDK'ê bi dewleta Tirk re înkar bike. Eger dewleta Tirk bibêje em şerê Tevgera Azadiyê dikin wê cihê pêkenînê be, ji ber mirovê têgihiştî û siyasetmedarekî ku kiryarên dewleta Tirk di derheqê gelê kurd de kirine, bizanibe wê nas bike ku armanca dewleta Tirk tunekirina gelê kurd e. Tevî ku ev rastî ji her kesan re diyar e, lê PDK'ê di hevkariyê de berdewam e, xema wê tenê berjewendiyên wê yên şexsî ne, û jê re ne xem e ku hevrêziya kurdî pêk were yan na. Lewma em dibînin tevkariya PDK'ê bi dewleta Tirk re li ser asta Kurdistanê tevî bûye cihê xeteriyê û wê bibe sedem ku gelê kurd rastî komkujî û tunekirinê were.

**Gelo di roja heyî de kurd xwe nekin yek û statûya kurdî pêk newe wê rewşa kurdan di siberojê dê çawa be?**

Bi rastî ev pirs ne hema wiha sivik e, dema ku em rewşê dinerxînin tabloyek derdikeve pêşiya me û tê de tê encam dan ku eger dijminên kurdan dijmin bi hewldanên xwe de bi ser bikeve, ti destkeftiyên kurdan ne li Başûr û ne li Rojavayê Kurdistanê wê nemînin. Ji ber ku dewleta Tirk vê carê amadekariyan dike ku li ser asta siyasî û pêkanîna peymanên bi dagirkerên Kurdistanê yên ku berjewendiyên xwe bi dagirkeriya Tirk re girê dide, tev bigere. Ev yek jî pilan û konsepteke xeternak e ji bo destkeftiyên kurdan, xeteriya mezintir ew e ku PDK'ê di nav vê plana dijminan de ye. Bi dirêjahiya dîroka kurdan, şoreş û serhildanên kurdan hatine bidawîkirin, lê kurd nehatine tunekirin. Eger em bêjin kurd ne kurdên berê ne û bûye xwedî hêz, divê em baş di wê hişiyariyê de bin ku dagirker û dijmin jî ne yên berê ne. Tişta ku dewleta Tirk di dema heyî de dike tiştekî pir xeternak e ji bo hebûna kurdan. Dewleta Tirk a dagirker di sala bûrî de ango di sedsala Lozanê de dixwest Mîsaqa Milî li ser axa Rojava û Başûrê Kurdistanê pêk bîne, lê bi hin mijarên din ve mijûl bû. Di asta navnetewî de jî ger em binirxînin, eger Tiramp dîsa di hilbijartinan de bi ser bikeve wê bandoreke neyînî li ser me kurdan hebe. Lê di eger niha gelê kurd û partiyên siyasî hedef û xwesteka dewleta Tirk a dagirk di dema heyî de nas bikin û fêm bikin ew ê di wê kêliyê de bibin yek. Ji ber vê jî hîn derfetek li pêşiya kurdan heye ku dest bidin hev û yekrêziyekê pêk bînin ji bo ku berjewendiyên xwe yên niştîmanî biparêzin. Dem dema hevrêziya gelê kurd û pêkanîna berxwedana li hembe dijminên me ye, aliyên ku tevlî vê yekrêziyê jî nebin wê dîrok hesaban ji wan bixwaze, ji wan jî PDK'ê.

# ŞEFÊ JITEM'A BAŞÛRÊ KURDISTAN'Ê; MESÛD BERZANÎ



**Cîger Dilşad**

Li çar perçeyên Kurdistan'ê beşek ji Kurdên ku derbarê dîroka MESUD BERZANÎ de zêde agahîya wan tune ye, bi awayekî mafdar ji sekna MESUD BERZANÎ şaşwaz bûne. Lê yên ku dizanin ka vê malbatê çi kirî û çawa xwe gihandî roja îro, şaşwaz nabin.

Rêber APO her hewl da ku MESUD BERZANÎ ji rewşa tê de derxîne û wî ji xizmetkirina neyarên Kurdan dûrbixe. Heta tevî ku maf nekirî jî, jê re pêşniyar kir ku bibe hevserokê Kongra Newtewî. Rêbaza Rêber APO ew e ku, xayînan, kom û kesên di xizmeta neyaran de ne bi awayekî wan têxe xizmeta têkoşîna gel. Yên ku piçek rûmet bi wan re ma bû, dev ji wan karên xwe yên qirêj berdan. Lê yên mîna MESUD BERZANÎ qet rojekê jî dev ji xizmetkirina efendîyên xwe bernedan. Çima?

Di serî de vê bêjim; MALBATA BERZANÎ ji destpêkê de wekî malbateke ji her hêlê ve bi neyar ve girêdayî bi destê sîyasetmedarên Îngilîz derketin ser dika sîyaseta Kurdistan'ê. Divê hemû Kurd û di serî de jî xelkê me yê li başûr û bi taybetî jî xelkê me yê li herema Soran qet ji bîr nekin ku, heger Ehmet BERZANÎ îxanet li Mahmud BERZENCÎ nekira, wê keyîtîya Mahmud BERZENCÎ hilneweşîya û Kurdistan di dest pêka salên 1920'an de bihata saz kirin. Tam di heyama ku Îngilîz di şerê li dijî Şêx Mahmud de bêçare bûbûn de, Ehmed BERZANÎ îxanet li Şêx Mahmud kir û derbasî hêla Îngilîzan bû. Ji wê demê ve êdî bi temamî MABATA BERZANÎ bû şebekeyeke çeteyan di destê Îngiltere de.

MESUD BERZANÎ bi kiryarên xwe yên li gorî berjewendîyên dewleta Tirk ya dagirker û qirker bûye ŞEFÊ JÎTEM'a başûr. Li bakur Ehmed Cem ERSEFER YÊ JÎTEM'Î çi dikir, îro MESUD BERZANÎ li başûr heman tiştî dike. rojnamevanan direvîne, dijberên sîyaseta MALBATA BERZANÎ dikuje, dizî û talanê dike, zagon li holê nehiştîye û li dijî Tevgera Azadîyê şer dike lê li kiryarên xwe yên dijminane xwedî dernakeve. Heman mîna ŞEFÊ JÎTEM'ê bi awayekî nemerdane û dervayî axlaqê civakî namûsa xwe pêşkêşî serbazên Tirk û dewleta Tirk dike.

Ji xwe gava mirov dîroka MALBATA BERZANÎ tîne berçavan dibîne ku ji destpêka derketina ser dika dîrokê , ti têkilîya wan bi Kurd û Kurdistan'ê re tune ye. bi pereyan li gorî berjewendîyên efendîyên xwe tevgerîyan e. Lê ji dîroka serdestên Tirkan em baş dizanin ku, gava karê MESUD BERZANÎ qedîya, dewleta Tirk kêlîyekê jî wan nade jîyan kirin. Me di pêvajoya referandûma sala 2017'an de ew yeka pir vekirî dît.

Ji lewra peyva "xayîn" tam rewşa MALBATA BERZANÎ bi wate nake. Şebekeyeke çeteyan e ku li ser xwîna keç û xortên Kurdan û li ser siberoja Kurdan xwe dide jîyan kirin e.



# 'Em ê li hemberî zext û tûndiyê govenda xwe bigerînin û sitranên xwe bêjin'

Li Bakûrê Kurdistanê zexta li ser çand û hunera Kurdî zêde bûye. Li bajarên Bakûrê Kurdistanê stranbêj û welatiyên ku govendên kurdî digrin, tên binçavkirin. Hevseroka Desteya Çand û Hunerê ya Dem Partiyê Cemîle Turhalli da xuyakirin ku dewleta Tirk ya dagirker li dijî çand, ziman û hebûna gelê Kurd û Kurdistanê ye, ji ber wê nikare stranên Kurdî jî bibihîze.

**Navenda Nûçeyan**

Di derbarê qedexekirina çand û hûnera Kurdî li Bakûrê Kurdistanê, herwiha zext û bişaftina ku li ser zimanê Kurdî tê meşandin, hevseroka Desteya Çand û Hûnerê ya Dem Partiyê Cemîle Turhalli ji rojnameya me ra axifî:

**Piştî Peymana Lozanê Kurdistan kirin parçe parçe**

Cemîle Turhalli anî ser ziman ku pîştî peymana Lozanê dagirkeran Kurdistan li gorî berjewendiyên xwe dabeş kirine û wiha domand: 'Yek ji wan beşê ku hatiye dagirkirin jî, Bakûre Kurdistanê bû. Armanca wan dagirkeran ya herî mezin Tirkkirina hemû netewên cuda bûn û Kurd jî di nav de. Lê Kurdan ev yêk ne pejirand û berxwedanê pêş xistin. Serhildana Şêx Seîd Heyanî Koçgirî û Gelîyê Zîlan berxewedan û tekoşîyan. Pir qirkirin û qetlîaman re jî rû bû ru man. Digotin dewleta Tirk dewleteke Mislimane, ti ol û netewên cuda nikare têde jiyan bike. Jiber hejmara welatiyên Kurdistanê ne hejmareke kêm e, tiştê nekarîn bi kuştinê û qirkirinê pêk bînin bi bişaftinê pêk tînin''

**'Dewleta Tirk hewil dide kurdan di pişaftinê re derbas bike'**

Cemîle Turhalli bibîrxist ku ev dûjminahiya Kurdan ya bi salane tê kirin û berdewam kir: ''Gelê kurd geleke ku xwedî rûmete û ti caran gav bi paşda jî na avêje. Ti caran jî heya mafê xwe dest negire tekoşînê berdewam dike. Pêwîste ev berxwederîya ku gelê Kurd dike, hemû cîhan bibihîse û deng bide. Rewşenbîr û hunermendên gelê Kurd pêşengê gelê Kurdin, divê vê xebata xwe bigihîn in asta herî jor. Jibona ku zarok û ciwanên me, xort û keçên me bi zimanê xwe bi azadî baxivin.''

**'Mafên ku gelê Kurd daxwaz dike weke şîrê dayikê ye, mafên bingehîn e'**

Cemîle Turhalli balkişand ser girîngiya zimanê dayikê û pişaftina ku li dijî wê tê meşandin û wiha got: ''Zimanê dayikê mafekî rewa ye û weke şîrê dayikê helal e. Dive civak vî tiştî baş fêm bike. Ev bar jî dikeve li ser milê hûnermend, sîyasetmedar û pêşengên civakê de. Divê em zimanê Kurdî bikin zimanê hunerî, zimanê aborî û ya herî giring jî zimanê jîyanî. Divê zimanê dayikê raya giştî da sazî û komeleyan de her derî de bidin axiftin. Herî dawîyê lê Bajarê Wanê yê Bakûrê Kurdistanê nivîsa ku di alîyê şarederîya Bajarê Mezin Yê Wanê hatiye nivisandin ya ku ''Pêşîyê Peya''di aliyê nijadperestan hat jê birin. Li şuna wê jî nivisên nijadperestî hatin nivisandin. Dewleta Tirk ya dagirker jiber ku rewa nabîne ku bi nivîsek Kurdî ser kolana bê nivîsandin û govendek azad bê gerandin''

**'Ji ber ku gelê Kurd gelekî berxweder e, nekarin qirkirinê pêk bînin'**

Cemîle destnîşankir ku jiber gelê Kurd pir asîmilasyonê we rû bû rû maye û wisa axift ''Metînger û dagirkeran Kurdistan kirin 4 parçe lê nekarîn rih û yekitiya gelê Kurd bikin parçe parçe. Ziman û çanda kurdî zimanê Kurdistanê ye, ne nekarîn dabeş bikin. Ev jî girêdayî hebûna gelê Kurde, hestên wan yê welatparêzîyê ye. Ev jê berxwederîya keç û xortên gelê Kurd tê. Pêwîste berxwedanîya li hemberî bişaftinê hîn zêdetir bê xurt kirin. Pewîste çawa deskeftîyên me li Rojavayê Kurdistanê hatiye avakirin heman demê de em li her sê parçeyên din jî deskeftîyan dest



bixin. Dibe em van deskeftîyan em wegerînin serkeftinê. Dibe em lingê wê yê diplomasî lingê wê yê hûnerî û lingê wê yê aborî kurtasî di hemû aliyan da xurtbuyin pêwîste, hemberî dujmin jibona têkbirina ziman û çanda xwe tekoşîn pêwîste.''

**'Pergala Netewa Demokratîk bûye mînaka jiyana azad'**

Cemîle axiftina xwe wisa dawî kir ''Her 4 beşên Kurdistanê jî êrîş û zextên pir giran li ser gelê Kurdistnê didome. Lê Rojavayê Kurdistanê bi ramanên Rêberê gelê Kurd Rêber Abdullah Ocalan ya bi paradîgmaya ''Civaka Demokratik, Ekolojîk û Azadiya Jinê'' jîyanek azad ava bûye. Em tekoşîn dikin ku wê modela jîyanê hemû beşên dîn bi taybet jî Bakûre Kurdistanê bikin şêwaza jîyanê. Dujmin çi kas tecrîd û zextî pêş bixe jî, nikare fikir û ramanên Rêber Abdullah Ocalan yê Netewa Demokratîk asteng bike. Em jî wek sîyasetmedar û jinekê ku Bakûre Kurdistanê jî dibejin emê heya dawîyê jibona ziman û çandê xwe qirkirinê xêlas bikin emê tekoşîna bilind bikin''

## Erdogan pêşengê suîkastcî û kujera ye



**Zekî Bedran**

Erdogan bi mûdexeleyên ku li Lîbya û Qerebax'a Ermenîstanê kiribûn, Îsraîl tehdit kir. Wek tê zanîn ku Erdogan çeteyên ku ji Sûryeyê biribûn û daxilî şerê Lîbya yê navxweyî kiribû, her wiha rê li ber kûrkirin û dirêjkirina şer vekiribû. Dîsa li dijî Qerebaxê ku bê parastin bû, bi SÎHA'yên di destê xwe êriş kiribû, hiştibû ku Azerbaycan wan herêman bi dest bixe. Erdogan'ê ku wêrekiya xwe ji xeyalên Osmaniyan yên berbelavbûnê digire, Îsraîl tehdît kir. Gava ku Îsraîl'ê bersiv da, ragihandina Erdogan û bêarên li derdora wî dest bi birbire kirin.

Gelo bi rastî Erdogan wê Îsraîlê tehdîd bike? Qet nabe. Ev axaftin û tehrîkên wî bi tevahî li ser raya giştî ya navxweyî ne. Erdogan dijminê Cihûyan e û xwedî armancên berbelavbûnê ye. Bi avahiya zihniyet û kesayeta xwe ya zalim, ji kirina her cure xerabiyê re vekirî ye. Tişta ku li Kurdan kirin ji ya ku li Filistîniyan hat kirin ne kêmtir e. Wî artêşa xwe şandiye ser axa Iraq û Sûriyeyê û mijûlî dagîrkirin û îlheqkirina wan e. Hemû armanca wê di serî de koçberkirin, çewisandin û qirkirina Kurdan e. Helbet ne pêbawer e ku Tirkiyeya xwediyê projeya qirkirinê ye ku bi dengekî bilind rexne li Îsraîliyan bike û tehdîd bike.

Erdogan hilbijartinê 31'ê Adarê winda kir. Di polîtîkayên derve û di berbelavbûnê de xetimî. Hêza xwe dît. Ji bo vê jî hewl da ku hemû welatên Ereban, Îsraîl jî di nav de, xwe xweş bike û têkiliyên wan baş bike. Di warê aborî de jî Tirkiye ber bi tunebûnê ve bir. Armanca herikîna pereyan jî hebû. Di siyaseta Erdogan de heq û edalet nîn e. Bi tevahî li ser hêz û berjewendiyê ye. Ji ber vê yekê jî gotinên wan ên weke ku li aliyê bindestan in bi bikaranîna pirsgirêka Filistînê bi tevahî demagojî û lîstina li ser siyaseta navxweyî ye.

Muxalefata Tirkiye'yê lewaz e. Rexmê ku CHP'ê di hilbijartinê de weke partiya yekemîn derket jî, lê nikarê xwe ji bûyîna duvikê Erdogan rizgar bike. Ozgûr Ozel di polîtîkaya derve de dibêje "em partiya Tirkiyeyê ne." An go mîna ku tîma futbolê destek bike, Erdogan destek dike, li kêleka polîtîkayên paşverû û dagirkeriyê disekine. Ji ber ku Tirkî li Sûryeyê kişand çalê, Erdogan rexne dikin. Lê bele tişta ku bû sedema vê yekê ku dijminahiya Erdogan a li dijî Kurda, tiştekî nû nabêjin.

Ranagihînin ku ew artêşa xwe ji Sûryeyê bikşînin. Ajotina artêşa Tirk a Iraqê û dijminahiya Kurdan rexne nakin.

Artêşa Tirk wê çend salên din li Iraqê bimîne? Napirsin bê ka berdêla vê dagirkeriyê çi ye û rexnenakin. Napirsin çima em bi Kurdan re aştiyê nakin, na pirsin û nabêjin ev dijminatiya li dijî Kurdan heya kengêye. Erdogan ji ber ku vê rewşa muxalefetê dibîne û dizane, ji bo ku bala gel ji siyaseta navxweyî û têkçûnên xwe dûr bixîne, balê dikişîne ser dijminahiya Kurdan û pirsgirêka Filistînê.

Erdogan nikare Îsraîl'ê tehdît bike. Dizane ku Îsraîl tenê ne Îsraîl e. Îsraîl tê wateya DYA û Ewropa. Ev hêz bi temamî li aliyê Îsraîlê ne. Erdogan wê Îsraîl bi çi tehdîd bike? Wê bi ÎHA û SÎHA di destê xwe de? Mirov dikare bi vê ya bikenê. Ev çek li hemberî parastina hewayî û alavên teknîkî yên mîna Îsraîlê bê wate ne. Her wiha balefirên di destê Tirkiyeyê de û hwd hemû malên DYA û Ewropayê ne. Her wisa, çima Erdogan bi vî rengî tevdigere? Wê tevbigere ji ber ku dijminatî û dijberiya bi Îsraîlê re li ser neteweperest û olperestan bi bandor e. Dixwaze bingeha netewperest û olperest di destê xwe de bigre û bi rêya olê jî bikşîne aliyê xwe.

Em her tim dibêjin Erdogan rêgez, exlaq û qanûnan nas nake. Em vê yekê bi dîtin û tecrûbeya salên dirêj yên desthilatdariyê dibêjin.

Sûriye wêran kir. Kargehên bajarên mîna Helebê hilweşandin û birin Tirkiyeyê. Berhemên dîrokî talan kirin. Bi DAIŞ'ê re bazirganiya petrolê dikirin. Li dijî Kurdan qirkirina etnîkî pêk anîn. Qirkirin jî tê de ti sûc nemaye nekirine . Niha jî mîna ku tiştek nebûbe, ji Beşar Esad re dibêje: "Were em hev bibînin, em aştiyê bikin." Çima ew ê aştiyê bike? Ji ber ku bi ser neket, nekarî Esad hilweşîne, nekarî bi temamî Kurdan ji holê rake. Dema ku planên wî bi ser neketin, ew dixwaze bi Esad re hevkariyê bike da ku Kurdan tune bike û Sûriyê bikşîne nav belayên nû.

Divê li Tirkiyeyê, Sûriye û Rojhilata Navîn ti gel û misilman ji hêzên nîjadperest û dagirker ên mîna Erdogan û Bahçelî bawer nekin û nekevin derewên wan. Ev gurên ku xwe xistine postên pez in. Çawa ku Îsraîl bi suîkastan dixwaze bi kuştina pêşengên Hamasê wan belav bike, Erdogan vê yekê hîn bêhtir li dijî tevgera Kurd dike.Li Sûriye, Iraq û Tirkiyeyê bi balafirên bêmirov û kujerên xwe nêçîra kurdan dikin û li pey hev qetil dikin. Ji yên ku xwedî li mezlûm û şervanên azadiyê derdikevin, kujer dernakevin.

## Nêzîkbûna dengê defa şer



**Farûk Sakik**

Li Tehranê bi kûştina Serokê Hemasê Îsmaîl Heniye, li Rojhilata Navîn şer derbasî merhaleyeke nû dibe. Dengê defa şer roj bi roj bilind û nêz dibe.

Hêzên hegemon, desthilatdar di destê wan de cedwel û pênûs, li ber wan nexşeya Rojhilata Navîn û di devê wan de herikandina gilêz û şorik, amadekariyên şer dikin.

Şer hatî ber derî. Dema ku li dîrokê binêrin bi hin sûîqestan şer dane destpêkirin. Şerê Cîhanê yê Yekem. Warisê textê Awûstrya-Macaristanê Franz Ferdinand di 28'ê Hezîrana 1914'an de, li paytexta eyaletê Saraybosna ji hêla neteweperestê Sirbî, yê bi navê Gavrilo Princip ve hat kuştin. Û ev kuştin bû hinceta Şerê Cîhanê yê Yekem.

Li Tirkiyê jî dema ku di sala 2015'an de xwestin li hember Kurdan şer bidin destpêkirin, Hulîsî Akar ji Hakan Fîdan hincetek-provoksiyonek xwest. Hakan Fîdan li Ceylanpinar 2 polîs da kuştin. Kuştina van 2 polîsan ji bo wan bû hincet û di 24'ê Tîrmeha 2015'an de şer da destpêkirin. 2 roj beriya vê kuştina 2 polîsan, li Pirsûsê komkujiyek pêk hatibû. Hakan Fîdan got; PKK ji bo tola Pirsûsê bigire ev 2 polîs kuştine.

Di nav civakê de gelek kesan bi vê yekê bawerî anîn û Tevgera Azadiyê tawanbarkirin.

Di çanda Kurdan de tolhildan, bilindkirina têkoşînê ye. Bi kuştina Apê Mûsa kurdan, Oktay Ekşî nekuşt. Bi kuştina Mehmet Sîncar dora rojê Cavît Çaglar nehat kuştin. Piştî komkujiya dewleta dagirker a Roboskî, Tevgera Azadiyê tu carî berê xwe neda û li Yozgatê komkujiyek pêk neanîn. Lê diha zêde barê wan giranbû û diha zêde têkoşiyan.

Em vegerin kuştina Serokê Hemasê Îsmaîl Heniye. Ev bi tenê nebe şerê Îran-Filîstîn û Îsraîlê. Wê ev şer li seranserê herêmê belav bibe. Her çiqas neyê zanîn ku wê şer tam kengê dest pê bike jî, ji anha de dest pê kiriye jî. Şer anha bi dîplomasiyên dewletan dewam dike.

Heger şerek ku dest pê bike Kurd xwedî kîjan amadekariyan e? Tu amadekariyek jî naxuyê. Çima? Rêberê Kurdan xeber tune ye da ku bi perspektîf û pêşdîtinên xwe, nexşerêyek bide destê Kurdan. Tam di demek wiha de pêwîstî bi perspektîfên wî hene.

Salek berî ku ji Tunûsê Bihara Gelan dest pê bike, Rêber Apo di hevdîtina bi parêzeran de bal kişandibû ser vê yekê û gotibû; li Rojhilata Navîn wê guhertin çêbibin û Kurd jî divê amadekariyên xwe bikin. Divê Kurd yekîtiya dîplomasî û eskeri ya xwe ava bikin. Yekîtiya netewî nehat avakirin. PDK bû asteng. Lê li Rojava şoreşek pêk hat.

Dewleta Tirk a dagirker ji bo vî şerî, hemû amadekariyên xwe temam kiriye. Bi dewletan re hevdîtinan pêk anîne. Tek pirsgirêkek li pêşiya wan heye. Ew jî rejîma Şamê ye.

Ji bo ku Kurd jî amadekarî nekin, di tecrîdê de israr dike.

Bi PDK'ê re li ser 'xiyanetê' peyman îmze kiriye. Li vê derê jî pêşî li hewldanên yekîtiya Kurdan girtiye. PDK îroj hatiye radeyek wisa ku daxwaza hevdîtinên saziyek wek KNK'ê ku ji bo yekîtiya Kurdan xebatê dimeşîne, bê bersiv hişt. Kurd divê vegerin û lêgerîneke nû bidin destpêkirin. Bê Rêber Apo û bi xiyaneta PDK'ê dikarin çibikin, di vî warî de kûr bibin. Dikarin çi bikin? Ji bo pêngava azadiya Rêber Apo encam bigire, divê bê sekin xebat werin meşandin. Ji xwe ev pêngav tempoya xwe ya destpêkê hinek sist kiriye. Divê vegerin kodên xwe yên 10'ê Cotmeha 2023'yan. Ev jî rexneyek e. Divê Kurd, li hemberî lîstik û siyaseta dewleta Tirkiyê û PDK'ê ya li herêmê dimeşînin, hişyar bin. Û li hemberî xiyanetê, xwedî helwest bin.